**_Kongra Netewiya Kurdistan_**
_Kurdistan National Congress_
**_Congrès National du Kurdistan_**

KNK

**_Rue Jean Stas 41 1060 Bruxelles tel: 00 32 2 647 30 84 fax: 00 32 2 647 68 49_**
**_Homepage:_** www.kongrakurdistan.com **_e-mail:_** knk@kongrakurdistan.com

www.kurdistannet.org

# Daxûyanî

**8 ê Adar Roja Jinên Kedkar ê Cîhan Pîroz be**

Bruksel, 07.03.03

Roja jinên kedkar ê cîhan 8 ê Adarê, sembola wekhevîtî, aştî û ked ê ye, ji hemû jinên cîhanê re pîroz be.

Jinên cîhanê, ji bo girêdana ked û nirxên xwe, bi tekoşîneke hêz û fedakirina gelek jiyanên jinan re, berxwedana xwe ji dîrokê re kirine mal. Bi vê tekoşînê ve di hemû beşên jiyanê de, ji bo ku cîhên xwe bigrin, pêşketinên girîng dest xistin.

Sîstema desthilatdariya zelam, li hemberî aştî, demokrasî û wekhevîtiyê astenge û li ser bingeha şîddetê pêk hatiye. Tekoşîna jinê, ku dixwaze sîstema alternatîf çêbike, him ji bo cîhanê, him jî, ji bo Kurdistanê pir girînge.

Jinên Kurdistanê bi tekoşîna xwe ya azadiyê, tekoşîna gelê me ya demokratî û netewî yek kirin û bi vî awayî diyar kirin ku azadî û yekîtiya gelê me de, rêberin.

Tekoşîna azadiya jinên Kurdistanê, ne ku tenê ji bo Kurdistanê, ji bo cîhanê jî girîng e û rêber e. Li ser vî esasî girêdan û rêza jinên Kurd ji tekoşîna azadiyê re, ne ku tenê di rojên 8 ê adarê de, di hemû rojên jiyanê de berdewame.

Kongre, bi gelemperî tekoşîna jinên cîhanê, bi taybetî jî tekoşîna jinên Kurd, wek hemleyeke mirovahiyê ya nû dibîne. Li ser vî esasî Kongre, roja jinên kedkar ê cîhan 8 ê Adarê car din coşeke bi dil pîroz dike.

Konseya Rêveber ya
Kongra Netewiya Kurdistan